# Ronahî

www.ronahi.net/ku/ Jimar : 928 29-Kanûn- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

**Navnîşan**
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165

# Heyfa Hesen: Wêjevanên Kurd qehremanên şoreşê zindî dikin.




**Nivîskar Heyfa Hesen: Jixwe lehengên ku di romana min de derbas bûne, hemî kesayetên rastî ne, ji ber vê yekê min belgekirina berxwedana wan wek erkekî giranbiha li ser milê xwe dît.**

Heyfa Heyder Hesen bal kişand ser romana xwe ya bi navê "Guline Ji Çiyayê Araratê" ku ev roman weke dîrokek nayê jibîrkirin bi nav kir.
Her wiha romanivîs û nivîskara pispor di warê romanê û kurteçîrokan de dibêje ku romana wê li ser çîroka herdu gerîlayên şehîd Kawa û Mihemed e ku her du jî birayên wê ne.
Her wiha nivîskar Heyfa destnîşan kir ku wê xwest wêneyên wan ji romana xwe re bike berg, ji ber ku ew mînakek zindî ne ku jiyanek sade û xwerû ya li çiyê temsil dikin, her wiha mebesta wê ew bû ku jiyana gerîlayên qehreman bi hemî taybetmendiyên wê bide zelalkirin.
-Te romanek bi navê "Guline ji Çiyayê Araratê" nîvisandiye, gelo romana te li ser çi ye û qala çi dike?
Gelek çîrok û serpêhatî di jiyana me de derbas dibin, êdî dema em van çîrokan bidin ser hev, wê demê wê romanên giranbuha durist bibin ku jan, azarî û serpêhatiyên bi me re derbas bûne vedibêje. Her wiha ew êş û azariyên miletekî jî tîne ziman. Ji ber vê yekê armanca min ji nivîsandina vê romanê ev bû ku were belgekirin û bibe dîrokek ku neyê jibîrkirin.
-Berî tu dest bi nivîsandina vê romanê bikî te du roman weşandibûn, yek jê bi navê "Li Wê Derê.. Em li Benda Şiveqê Bûn" û ya din jî bi navê "Me Bi Hev re Ax Hembêz Kir", gelo ev her du roman jî li ser jiyana her du şehîdên gerîla Kawa û Mihemed bûn, an jî li ser gerîlayên din bûn û ramana van her du berheman li ser çi bû?
Ne hêsan e ku mirov dîroka du şervanan bi hin xêzan sînordar bike yan jî jiyana wan û fedakirinên wan di pirtûkekê de binivîse. Ji ber vê yekê min aliyek ji jiyana van qehremanan nivîsand, ew leheng û qehremanên ku heya dawiyê bi lehengî şerê terora DAIŞ'ê kirin, êdî min xwest ez berxwedaniya wan bînim ziman ku çawa xwe kirin qurban û cangorî ji bo rizgarkirina welatê xwe.
Romana yekem ya bi navê "Li Wê Derê.. Em li Benda Şiveqê Bûn"; ev roman behsa şervanekê dike ku di kêliyekê de çavên xwe vedike û hişyar dibe ku xwe li rex rêhevalê xwe li nexweşxaneyê dibîne. Êdî demên berê bi bîr tîne û rewşa malbata xwe ya civakî ji destpêka tevlîbûna birayê wê nava refên gerîla û heya tevlîbûna wî nava şoreşa Rojava û heya ku çawa li dijî hêzên terorîst şehîd dibe tîne ziman. Êdî piştre ew soz dide ku ew ê tola birayê xwe hilîne û bi vî awayî tevlî refên Yekîniyên Parastina Jin li Efrînê dibe. Her wiha bi vî awayî bûyer diqewimin û rêz dibin, piştre bûyera sereke diqewime; dema ku dewleta Tirk êrîşî Efrîna rengîn û gundewarên wê dike û sivîlan bombaran dike, êdî ew bi hevalên xwe re berê xwe didin qada şer bo belgekirina bûyerên qada leşkerî û di rê de balefira dewleta Tirk li wesayîta wan dide û ew û hevrêyekî xwe birîndar dibin.
Di romana duyem de ya bi navê "Me bi hev re ax hembêz kir", ez behsa jiyana du şervanên Kurd dikim ku çawa li dijî terora DAIŞ'ê heya dawiyê şer kirin û şehîd dibin û piştre tê naskirin ku herdu birayên hev bûn, zewaca wan herduyan di rojekê de bû. Her wiha şehîdbûna wan jî di rojekê de şehîd dibin. Tu kesî nizanîbû ku herdu birayên hev in, tenê piştî ku di pêngava rizgarkirina Reqayê şehîd dibin, êdî tê naskirin ku herdu birayên hev bûn.
Ji vê yekê tê naskirin ku rêça şoreşê bi parçeyek erdnîgarî weke çiya û zinaran ve ne sînordar û girêdayî ye, lê belê şoreş hemî sînoran derbas dike ev yek jî li gor felsefeya ku şax û şitlên xwe li xaka Rojava çandiye û mezin bûye.
-Gelek nîqaş li ser têkiliya gelê Kurd ya xurt bi çiya re têne kirin, gelo romana te ya bi navê "Guline ji Çiayayê Araratê" li ser vê nîqaşê çi digire dest û mebesta te jê çi bû?
Dema ku dijmin me dorpêç dike û me ji xwe re dike hedef yekser em berê xwe didine çiyayan, ji ber ku çiya hêz û piştevana me ye, her wiha me ji gefên dijmin diparêze û tu carî dev ji me bernade. Ji ber vê yekê min li ser jiyana du gerîlayên qehreman nivîsand ên ku berxwedaniyek bêhempa li dijî êrîşên faşîzmaya Tirkiyeyê kirin. Ji bo rizgarkirina gel û welatê xwe, xwe feda kirin. Ew nîqaşa ku romana min behsê dike hê jî bi dawî nebûye û heya ku desthilatdarî û zilim hebe bi dawî nabe. Wekî tê gotin tu heval ji bilî çiyayan ji me re tune ye.
Di romana xwe de te behsa jiyana du qehremanên Gerîla, Kawa û Mihemed kir û têkoşîn û berxwedana wan a li hemberî dewleta Tirkan a dijmin, ji awayê vegotina te ji vê romanê re, herî kêm em dikarin wekî qehremantî, an jî wekî sûfîzma ji bo azadiyê bi nav bikin? Êdî Kawa û Mihemed kî ne û gelo ew weke mînak in ku jiyana gerîla bi me didin naskirin?
Kawa û Mihemed herdu birayên min in, ên ku berê xwe didine çiya ji bo azadî û rizgarkirina xaka welatê bindest û her wiha xwe dikine qurban û cangorî ji welat re.
Her wiha min xwest ku wêneyên wan bikim berg ji romana xwe re, ji ber ku ew mînakên zindî ne ku li çiyê jiyanek sade û xwerû temsîl dikin. Her wiha mebesta min ev bû ku jiyana gerîla bi hemî taybetmendiyên wê bînim ziman, ku çawa berxwedaniyek bêhempa li dijî dijminê zordar dikin û xwe ji bo gel û welatê xwe feda dikin.
-Bi vê romanê te xwest çi peyamê bigihînî Gelê Kurd ?
Berî her tiştî min xwest ku qehremantiya şervanan zindî bikim, ku çawa tevî zor û zehmetiyan berxwedaniya wan ji bo doza welat berdewam kir û vîna wan qet û qet neşikest. Jixwe lehengên ku di romana min de derbas bûne, hemî kesayetên rasteqînî ne, ji ber vê yekê min belgekirina berxwedaniya wan wekî erkekî giranbuha li ser milê xwe ve dît.
-Gelo girîngiya belavkirina van pirtûk û berheman çi ye û heya çi astê arşîvkirina qehremantiya gerîla giring e û gelo ev yek wekî erkekî welatparêzî ye an jî rola her rewşenbîrekî ye ku qewimandinên li çiyê û berxwedaniya bêhemp li dijî dijminê xwînkar bîne ziman?
Rola wêjevanên Kurd ew e ku lehegtî û qehremaniyên şoreşê zindî bike û neyên jibîrkirin. Wekî tê naskirin her şervanek bi tivingê li ber xwe dide û gelê xwe diparêze û her wêjevanek bi pênûsê berxwedaniyê dike ku her tim hewil dide bûyerên rasteqînî bi nivisandinê zindî bike, ew e yê ku dîroka gelê xwe ji windabûyînê diparêze û vê dîrokê ji nifşên bê re zindî dike. Jixwe gelê Kurd jiyanek tijî serpêhatî jiya û gelek serhildan li dar xist, da ku dîrok li ser berxwedaniya wan ya bêhempa re bibe şahid.
-Tu rola jina Kurd di warê nivîsandinê de çawa dinirxînî?
Jinê jî weke mêr gelek berhemên wêjeyî yên ku bi giştî xizmeta pirsgirêkên civakî û bi taybet xizmeta doza şoreşgeriyê diki, afirandiye. Bi vê yekê jinê hebûna xwe û hêza xweyî nivîsandinê, derbirînê û afrîneriyê ji civakê re ispat kir.
***ANF***

## QUNCIKA TÊGÎNAN

| | |
|---|---|
| Afirandin | Xuliqandin, çêkirin, peydakirin, sazkirin. |
| Bertek | Bersiv, cewab, nerazîbûn, neqayîlbûn. Gotinek yan kirinek li dijî gotinek yan kirina kesekî: Kurdan li dijî girtina nivîskarê Kurd bertek nîşan dan. |
| Darizandin | Mehkemekirin. |
| Gengaz | Tişta dibe ku bibe, tişta bûyîna wê ne diyar. |
| Nirx | 1.Biha, qîmet, fiyet, heq. 2.Tiştên girîng yên pîroz: Nirxên neteweyî. |
| Şîrove | Nêrîn û ramanê li ser mijarekê. Hevserok mijar baş şîrove kir |
| Pejirandin | Qebûlkirin, razîbûn, qayîlbûn: Gelek tişt xwestin lê min tev nepejirandin |
| Pêdivî | Tişta lazim, tişta ku divê hebe yan bê kirin, pêwîstî. Pêdiviya me bi erebeyekê heye |
| Pêkan | Mûmkin |
| Pêwîstî | Pêdivî, tişta lazim: Pêwîstiya me bi gelek tiştan heye |

## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | A | ■ | M | E | D | ■ | P | E | Z |
| 2 | A | L | Î | ■ | E | S | A | ■ | O |
| 3 | ■ | Î | ■ | S | ■ | S | P | Î | ■ |
| 4 | E | S | M | E | R | ■ | A | ■ | K |
| 5 | Q | ■ | A | D | ■ | J | ■ | M | Û |
| 6 | D | Î | K | ■ | B | Î | R | ■ | P |
| 7 | ■ | C | U | D | Î | ■ | E | Z | ■ |
| 8 | K | A | ■ | A | R | Î | Ş | E | N |
| 9 | Ê | D | Î | ■ | A | Ş | ■ | R | A |

## Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | ■ | | | | | ■ | | |
| 2 | | | ■ | | | | | ■ | |
| 3 | | | | | ■ | | | | ■ |
| 4 | ■ | | | | | ■ | | ■ | |
| 5 | | ■ | | ■ | | | | | |
| 6 | | | ■ | | | ■ | | | ■ |
| 7 | ■ | | | | | | ■ | | |
| 8 | | | | ■ | | ■ | | | |
| 9 | | ■ | | | ■ | | | | ■ |

**ÇEP-RAST**

1. Dirav... Notayek
2. Baneşana keserê... Kuriya mehînê
3. Têbinî... Cephe, bere
4. Dengê ku ji tiştê dikeve avê derdikeve
5. Celebek qaxizê nivîsê ku stûr e û rengê wê dişibe rengê kayê
6. Notayek... Baneşaneke gazîkirinê... Tûj
7. Tiriyê ku li per tavê hatiye hişkkirin... Nexweşiyek
8. Plakaya navneteweyî ya Iraqê... Ji bo qewirandina heywanên mîna mirîşk û qazan
9. Bi rûsî erê... Rengek

**JOR-JÊR**

1. Demên rojê... Plakaya navneteweyî ya Tirkiyê... Plakaya navneteweyî ya Îranê
2. (Şîrê ...) Şîrê cara yekê yê di piştî zayînê, ku rengê wê zerik e... Temen
3. Beranê 1-2 salî... Dîwarê ku ji xaliyê hatiye çêkirin
4. Dema mirinê... Cînava şexsê sisiyan ji bo rewşa netewandî
5. Yezdanekî misrî... Demsalek
6. Bi erebî "ez"
7. Beşer, mirov... Pirsek di rewşa ne tewandî de
8. Di argoyê de pereyê yekî jê xwarin
9. Rojek... Daçekek ku wateyê xurt dike... Cihê heranê

---




## Jimara şehîdên bombeberana li Kobanê gihîşt 5'an

Di êrişa êvarê Şemiyê de ya ji aliyê dewleta Tirkan yaa dagîrker ve li Kobanê hatî kirin jimara şehîdan gihîşt 5 kesan. *R-3*



## KCK: Ji bo Roboskê divê têkoşîn bênavber dewam bike

Hevserokatiya Konseya Rêveber ya KCK'ê 33 ciwanên Roboskî yên 28'ê Kanûna 2011'an bi balafirên şer yên dewleta Tirkan hatîn kuştin bîr anîn û got, divê ev têkoşîn bênavber dewam bike heta sûcdar bêne darizandin. *R-5*

# Ronahî

www.ronahi.net/ku/ Jimar : 928 29-Kanûn- 2021 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

## Xistina PKK ya "lîsteya terorê" kiryareke dermirovî ye



Welatparêzê ji bajarê Qamişlo Rêber Gulo diyar kir ku PKK doza azadiya gelan dike û got, xistina PKK ya "lîsteya terorê" bêbextiyeke mezin e, divê gelê Kurd vê qebûl neke. *R-5*

# GIRTINA DERIYAN XWESTEKA DAGÎRKERAN E

Berî niha bi 12 rojan PDK'ê deriyê Pêşxabûr li ser Rojava girt. Piştî du rojan jî deriyê El Welîd girt. Siyasetmedarên bakur û rojhilatê Sûriyê dan zanîn ku girtina deriyan karteke derexlaqî û dermirovî ye û gotin, ev biryar dikeve xizmeta dijminê gelê Kurd û bandoreke neyînî li têkiliyên Kurdistanê dike. Herwisa gotin, ji bo ku gel bertekan nîşanî Rêveberiya Xweser bide deriyên sînor girtin. R-4





## Destkeftiyên jinan yên sala 2021

Li bakur û rojhilatê Sûriyê jinan sala 2021'ê di qada siyasî, dîplomasî, aborî û rêxistinî de gelek destkeftî pêk anîn. Rêxistinên jinan asta çalakiyên xwe zêde kirin da xwe bigihînin beşeke herî mezin ya jinan û destekê bidin wan ku maf û azadiya xwe bi dest bixin. *R-2*



## Gelên herêmê wê li hemberî dagîrkeran têbikoşin

Jinên bajarê Qamişlo êrişên dewleta tirkî ya dagîrker yên ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê şermezar kirin û bang li dewletên garantor yên li herêmê û civaka navneteweyî kirin ku pêşiya êrişên dewleta tirkî yên li dijî gelên bakur û rojhilatê Sûriyê bigirin. *R-2*



## Desteya Rêveberiyên Herêmî û Jîngehê ya Firatê civîna xwe ya salane li dar xist

Desteya Rêveberiyên Herêmî û Jîngehê ya Herêma Firatê civîna xwe ya salane li dar xist, plansaziya sala bê eşkere kir. *R-6*

## Çalakvanên Sêmalka banga radestkirina cenazeyên şehîdan kirin




Çalakvanên li Sêmalka nedana PDK`ê ya cenazeyên 5 şehîdan şermezar kirin û bang li PDK`ê kirin ku li şûna deriyê Pêşxabûr û El-Welîd bigire, divê cenazeyên şehîdan radestî malbatên wan bike. *R-3*

## "Rêveveriya Xweser ne mecbûr e barê çeteyan hilgire û divê werin darizandin"



Malbatên şehîdan gotin, divê malbatên çeteyên DAIŞ'ê ji bakur û rojhilatê Sûriyê werin derxistin û banga avakirina dadgeheke navneteweyî ji bo darizandina çeteyan li ser xaka bakur û rojhilatê Sûriyê kirin. *R-4*

## Tîma Rojava ya fotbolê di civîna salê ya li Awusturya de xebata xwe nirxand



Tîma Rojava ya fotbolê li navenda xwe ya li paytexta Awusturya Viyana civîna xwe ya salê li dar xist. Di civînê de ku endamên tîmê û gelek piştgirên wê amade bûn, xebata îsal ya tîmê hat nirxandin û plana sala bê hat danîn. *R-7*

## Di merasima bîranîna şehîd Zerdeşt Îsmaîl de pirtûka wî hat imzekirin



Di salvegera 23'yan ya şehadeta têkoşer Zerdeşt Îsmaîl Ebdulmecîd (Rizgar) de, pirtûka wî ya "Avdana agir" hat imzekirin. *R-7*

# Destkeftiyên jinan yên sala 2021`ê

**Li bakur û rojhilatê Sûriyê jinan sala 2021'ê di qada siyasî, dîplomasî, aborî û rêxistinî de gelek destkeftî pêk anîn. Rêxistinên jinan asta çalakiyên xwe zêde kirin da xwe bigihînin beşeke herî mezin ya jinan û destekê bidin wan ku maf û azadiya xwe bi dest**



Di çaroveya bûyerên ku li bakur û rojhilatê Sûriyê de, rola mezin ya jinan derket pêş. Ji bo rêgirtina li ber tundiyê û dîtina çareseriyan ji aloziya jinan re xebat hate meşandin. Li gorî daneyên cîhanî yên derbarê mafên mirovan de, her tim di radeya yekemîn de jin dibin hedef.

Li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê jî ji bo parastina jinan, danasîna maf, dîrok û hêza jinan, her wiha ji bo hesabxwestina ji dagirkeriya Tirk ji ber sûcên wê yên li hemberî jinan, di heman demê de ji bo gihandina nameya jinan ji tevahî cîhanê re, xebateke bêhempa hate meşandin.

### ABORÎ

Bi armanca destekayîna aboriya jinan, Komîteya Aborî ya Jinan a Bakur û Rojhilatê Sûriyê gelek proje pêk anîn.

1'ê Çile, civînên berfireh ji jinên koçber ên ji bajarê Serêkaniyê re hatin lidarxistin. Di çarçoveya van civînê de, 5 hezar û 800 donim zeviyên çandiniyê ji jinan re hate veqetandin da ku wekî kooperatîf projeyên çandina genim û ceh vekin. 78 jinên ji Serêkaniyê beşdarî vê projeyê bûn.

2'ê Çile, yekemîn car li kantona Hesekê kartol ji aliyê Komîteya Aborî ya Jinan a Hesekê ve hate çandin.

30'yê Gulanê, beşa jin a Desteya Aborî ya Herêma Cizîrê kargeha Zozan a mast û penêr li navçeya Dêrikê ya kantona Qamişlo vekir, ev kargeh a yekemîn li ser asta herêmê û ya duyemîn li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye.

1'ê Hezîranê Weqfa Jinên Azad a Sûriyê nivîsgeha xwe li bajarê Minbicê vekir da ku rola jinan di aliyê fikirî û aborî de pêş bixe.

8'ê Mijdarê Nivîsgeha Jinan a Şaredariya Gel a Reqayê yekemîn kargeha madeyên paqijiyê bi lêçûna 4 hezar dolar vekir.

### DÎPLOMASÎ

22'yê Hezîranê, şandeyek ji herêma Katalonyayê serdana navenda Kongra Star a kantona Qamişlo kir. Şande ji parlamenterên Katalonyayê Lulia Regovat û Ruben Wagensbeeg, endama Meclisa bajarê Barcelona Laura Preez, endama Rêxistina Siyasî û Civakî Omnivm Montes, endamê Tevgera Edalet û Rûmeta Navneteweyî ya ji bo Penaberan Kifer Mikl û rojnamevan û derhênerê belgefîlmên li ser pirsgirêkên civakî Jon Kerlet pêk dihat.

29'ê Hezîranê, jinên Rojava yên li Almanyayê di kongreyekê de ku bi diruşma "Şoreşa Jin Misogeriya Jiyana Azad e" Rêxistina Kongra Star a Ewropa raghiand.

29'ê Hezîranê, Konferansa Damezrîner a Yekiya Jinên Êzizî yên Rojava li kantona Şehbayê hate lidarxistin, 300 jinên êzidî yên ji herêmên Cizîrê û Efrînê beşdarî konferansê bûn. Konferans bi diruşma "Bi Fikirê Neteweya Demokratîk Wê Jinên Êzidî Yên Rojava bi Serkevin" hate lidarxistin.

21'ê Îlonê, Şaredariya bajarê Lion ê Fransaziyê navê siyasetmedara Kurd û sekretêra giştî ya Partiya Sûriya Pêşerojê ya berê Hevrîn Xelef li qadekê kir.

30'ê Mijdarê, şandeyek jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi vexwendineke fermî ya herêm û Şaredariya Duranco û rêxistina sivîl "Suargi" û bi armanca xurtkirina peywendiyên di navbera her du gelan de serdana herêma Baskê kir.

Di sala 2021'an Mala Êzidiyan a Herêma Cizîrê 12 jinên êzidî yên ku di dema êrişên çeteyên DAIŞ'ê yên li ser Şengalê de hatinbûn revandin, ji Rêveberiya Kampa Holê wergirtin.

### ÇALAKIYÊN RÊXISTINÎ

6'ê Çile Ajansa Nûçeyan a Jinan "JINHA" dest bi weşanê kir.

17'ê Çile, Koordînasyona Kongra Star a Rojava, qonaxa duyemîn a pêngava "Na ji dagirkirin û qirkirinê re, bi hev re em jin û jiyanê biparêzin" ragihand. Armanca pêngavê ew e ku balê bikişîne ser sûcên dagirkeriya Tirk û çeteyên wê yên li dijî jinan.

5'ê Sibatê, bi biryarekê, Koordînasyona Jinan bû beşek ji Meclisa Giştî ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê, da ku zemîneke gundaw ji bo çareserkirina pirsgirêkên jinan ên di nava rêveberiyê de were danîn.

6'ê Adarê, jinên efganî, îranî, Kurd û Ereb kongreyeke bi rêya online li dar xistin.

25'ê Adarê, Kongra Star bi armanca rakirina tecîrda li ser rêber Abdullah Ocalan û banga eşkerekirina rewşa tenduristiya wî konê çalakiyê li parka Arî ya bajarê Qamişlo veda.

11'ê Nîsanê, Kongreya Yekemîn a Meclisa Jinan a Bakur û Rojhlatê Sûriyê bi diruşma "Şoreşa jinê misogeriya civakeke azad û demokratîk e" hate lidarxistin, 21 endamên meclisê hatin hilbijartin, di nav de 7 jin endamên partiyên siyasî ne.

26`ê Gulanê Konferansa Duyemîn a Meclisa Jinan a Malbatên Şehîdan a Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi dirûşma "Têkoşîna jina azad parastina nirxên şehîdan û garantiya Şoreşa Rojava ye" hate lidarxistin.

1`ê Hezîranê di kongreya yekemîn a damezirandinê de ku li Reqayê pêk hat, avakirina Kombûna Jinên Zenûbya hate ragihandin, her wiha rêveberiyek ji bo Tebqa, Reqa, Dêrazor û Minbicê hate hilbijartin ku bingeha hêvî û xwestekên jinên Sûriyê ye.

18`ê Hezîranê konferansa yekemîn a Weqfa Jinên Azad li Sûriyê hate lidarxistin.

### XEBATÊN JINAN LI SER ASTA ÇANDÎ Û HUNERÎ

8'ê Çileyê navenda Jineolojî li kantona Şehbayê careke din hate vekirin. Navend ji ber êrişên dewleta Tirk a dagirker ên li ser Efrînê 3 salan hatibû girtin.

1`ê Adarê Mihrîcana Wêje û Hunera Jinan hate orgenîzekirin.

3`yê Nîsanê Navenda Lêkolînên Jeolojiyê li taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê yên Helebê hate vekirin.

25`ê Hezîranê Desteya Jinan a Herêma Cizîrê "Mala Parastina Zarokan" li taxa Mişêrfê ya Hesekê vekir da ku piştgiriya zarokan bikin.

5`ê Tebaxê Tevgera Kevana Zêrîn a Bakur û Rojhilatê Sûriyê li Hesekê navenda Kezwan a Çanda Jinan vekir da ku jin di aliyê hunerî de bi pêş bikevin.

Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê madeya Jeolojiyê piştî hinek guhartinan li meteryalên 2021-2022 zêde kir.

### LI HERÊMÊN DAGIRKIRÎ SÛCÊN DEWLETA TIRK

Li gorî Rêxistina Mafên Mirovan a Efrîn-Sûriyê ji 1`ê Çileyê heta 30`ê Mijdarê 13 jin û 13 zarok hatine qetilkirin, 75 jin, 5 jinên temenbiçûk û zarokekî şîrmij hatin revandin.

Bi serkêşiya Rêxistina Lêkolînan û Mafên Jinan li Sûriyê, Rêxistina Însiyatîfa Hiquqî û Navenda Rojava ya Lêkolînên Stratejîk, Rêxistina Mafên Mirovan a Efrîn-Sûriyê û Rêxistina Mafên Mirovan a Cizîrê 30`yê Çileyê li ser sûcên artêşa Tirk û çeteyên wê yên li kantona Efrîn a dagirkirî komxebata duyemîn li dar xist.

30`ê Çileyê li ser sûcên artêşa Tirk û çeteyên wê yên li kantona Efrîn a dagirkirî fourma duyemîn bi serkêşiya Rêxistina Lêkolînan û Mafên Jinan li Sûriyê, Rêxistina Însiyatîfa Hiquqî û Navenda Rojava ya Lêkolînên Stratejîk, Rêxistina Mafên Mirovan a Efrîn-Sûriyê û Rêxistina Mafên Mirovan a Cizîrê li dar ket.

### BERNAMEYA TÊKOŞÎNA LI DIJÎ TUNDIYA LI SER JINAN

Di Gulanê de Kongra Star û Meclisa Jinan a Partiya Sûriya Pêşerojê ji Bakur û Rojhilatê Sûriyê tev li pêngava têkoşîna li dijî siyasetên qirkirina jinan bûn. Pêngav ji aliyê Rêxistina Jina Kurd ve hatibû orgenîzekirin û 47 rêxistinên jinan ên cîhanê û 181 çalakgerên jin tev li bûn.

30 û 31`ê Tîrmehê Kongreya Duyemîn a Jinên li Rojhilata Navîn û Bakurê Afrîkayê li paytexta Lubnanê Beyrûtê hate lidarxistin. Di kongreyê de îşaret bi pirsgirêkên Rojhilata Navîn û bakurê Afîkayê hate kirin ku di serî de jin bûne qurban.

30`ê Cotmehê Desteya Jinan a Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê di civîna xwe ya mehane de, reşnivîsa rêziknameya Navenad Parastina Jinên li Ber Tundiyê ku ji 12 madeyan pêk dihat, mohr kir.

19`ê Mijdarê Konferansa Sêyemîn a Meclisa Jinên Edaleta Civakî ya Herêma Cizîrê li dar ket û bi gelek biryaran bi dawî bû.

20`ê Mijdarê Tevgerên Jinên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê programa Roja Cîhanê ya Têkoşîna li dijî Tundiya li ser Jinan ragihand û heta 10`ê vê mehê dewam kir.

30`ê Mijdarê li herêma Cizîrê bi hezaran mêr daketin qadan û banga rakirina tundiya li ser jinan kir.

***ANHA***

# Gelên herêmê wê li hemberî dagîrkeran têbikoşin

**Jiyan Ebas- Qamişlo**

**Jinên bajarê Qamişlo êrişên dewleta tirkî ya dagîrker yên ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê şermezar kirin û bang li dewletên garantor yên li herêmê û civaka navneteweyî kirin ku pêşiya êrişên dewleta tirkî yên li dijî gelên bakur û rojhilatê Sûriyê bigirin.**

Di berdewamiya şerê li dijî gelên bakur û rojhilatê Sûriyê de dewleta tirkî ya dagîrker bi awayekî sîstematîk û di çarçoveya domandina şerê qirkirinê yê li dijî herêmê de, 25`ê Kanûnê bi balafireke bêmirov li rojhilatê Kobanê li taxa Şehîd Payman malek kir amanc. Di encamê de pênc sivîlan jiyana xwe ji dest da û du kes jî birîndar in.

Ji rêveberiya Kongreya Star şaxê Qamişlo Rodîn Îsa, êrişên hovane yên dewleta tirkî yên ser herêmên ewle û bi taybetî ser sivîlên gundewarê Til Temir, Zirgan û bombebarana li bajarê Kobanê şermezar kirin û got, tevî peymanên rawestandina şer ji aliyê hêzên garantor ve, dewleta tirkî ya dagîrker êrişên hovane didomîne."

Rodîn Îsa da xuyakirin ku kesên di bombebaranê de dibin amanc sivîl in û got amûra hovîtiyê cudayiyê naxe navbera jin, zarok, sivîl û şervanan.

Rodîn Îsa di dawiyê axaftina xwe de bang li dewletên garantor yên li herêmê û civaka navneteweyî kir ku



pêşiya êrişên dewleta tirkî yên li dijî gelên bakur û rojhilatê Sûriyê bigirin.

Herwiha endama Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Hêvîn Hesen êrişên dewleta tirkî şermezar kirin û wiha got: "Ji destpêka krîza Sûriyê ve, dewleta tirkî ya dagîrker gefên dagîrkirinê li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê diwxe. Bi van gef û êrişan dixwaze xwe li bakurê Sûriyê bi cih bike û siyaseta xwe li ser vî bingehî dide meşandin. Rayedarên Tirk ji bo xewn û xeyalên dagîrkirinê bi şev û roj planan saz dikin. Dagîrkerî dixwaze ji krîzên Rojhilata Navî sûdê bigire û dagîrkirina xwe li herêmê fireh bike."

Hêvîn da zanîn ku siyaseta dewleta tirkî ya faşîst ji her kesî re eşkere bûye û axftina xwe wiha domand: "Siyasta dewleta tirkî zelal e, Projeya Biratiya Gelan ya demokratîk û aştîxwaz, ya li ser bingehê wekhevî û edaleta civakî ava bûyî qet qebûl nake."

Endama PYDê Hêvîn Hesen ji gelên herêmê xwest ku rêxistina xwe xurt bikin û axaftina xwe wiha qedand: "Pêwîst e em hêza civakê bikin bingeh û li ser bingeh û çanda gelê berxwedêr



li ber xwe bidin. Lewra ti dewlet wê gel neparêzin. Çavên dewletên faşîst li ser herêmên Rêveberiya Xweser e. Niha amadekariya ji bo berxwedana li hemberî êrişan di asteke bilind de ye. Peyama me ji bo cîhanê ev e; çawa bakur û rojhilatê Sûriyê bû sembola berxwedanê, ew berxwedan wê dewam bike û êriş têk biçin."



# Di merasima bîranîna şehîd Zerdeşt Îsmaîl de pirtûka wî hat imzekirin

**Di salvegera 23'yan ya şehadeta têkoşer Zerdeşt Îsmaîl Ebdulmecîd (Rizgar) de, pirtûka wî ya "Avdana agir" hat imzekirin.**

Merasîmê bîranînê ji aliyê Yekitiya Reşenbîran a Herêma Cizîrê ve li Navenda Dicle ya Çand û Hunerê ya Dêrikê ya kantona Qamişlo hat lidarxistin. Bi dehan nivîskar, rewşenbîr, malbatên şehîdan û malbata şehîd Rizgar amade bûn. Merasîm bi deqeyeke rêzgirtinê dest pê kir, dûvre endama Kombûna Perwerdê ya Zimanê Kurdî Behaa Betal pêşgotina danasandina pirtûk û nivîskar ku ji hêla Bahoz Erdal ve hatiye nivîsandin, xwend.

Di pêşgotinê de wiha hate gotin: "Şehîd Zerdeşt ji Dêrikê ye, xwendina xwe ya seretayî, navîn û amadehî li navçeyê xwend. Endazyara medenî li zanîngeha Helebê xwend û di ciwantiya xwe de tevgera azadî ya şoreşgerî nas kir û di 1988'an de tev lê bû, û li çiyayên Besta, Cûdî û Botan geriya. Di 26'ê Kanûna 1998'an de li herêma Gabar a Botanê şehîd bû."

Dûvre komek ji helbestên r şehîd Zerdeşt ji hêla endamên Yekitiya Rewşenbîran şaxê Dêrikê û birayê şehîd Laleş Îsmaîl ve hatin xwendin.

Piştre sînevîzyonek 20 deqeyan li ser têkoşîna şehîd Zerdeşt hate pêşandan.

Paşê birayê şehîd Zerdeşt, Egîd Îsmaîl Ebdulmecîd peyama Fermandarê Giştî yê Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) Mezlûm Ebdî ji bo vê boneyê xwend û wiha tê de hate gotin: "Şehîd Zerdeşt tev li Tevgera Azadiya Kurdistanê bû û berê xwe da Ewropa ku dest bi çalakiyên xwe yên dîplomasî bike û di wê serdemê de roleke dîplomasî ya aktîf lîst. Lê partiyê jî di wê qonaxê de plan dikir ku çalakiyên xwe yên rêxistinî li gelek dewletên Ewropa û Yekitiya Sovyetê ya berê fireh bike û şehîd Zerdeşt ji bo vê yekê hat erkdarkirin."

Li aliyekî din jî endamê Yekitiya Rewşenbîran şaxê Girkê Legê Bradost Mîtanî behsa rola kesayetên şoreşger di şoreşan de kir û ev tişt got: "Di salvegera 23'yemîn a şehadeta şehîd Zerdeşt de û bi vê boneyê em çiqas li ser fedekariyên şehîdan biaxivin em nikarin mafên wan bidin.



Ji ber şehîdên me têkoşîna xwe vebijartin û erka dikeve ser milê me jî em têkoşîna wan biparêzin û ji civakê re wan têkoşîna wan eşkere bikin."

Her wiha piştre rojnivîs û helbestên şehîd Zerdeşt ji hêla birayê wî Laleş Îsmaîl Ebdulmecîd ve hate îmzekirin.

Di pirtûka ku ji 164 rûpelan pêk tê , wêneyên şehîd Zerdeşt û 44 helbestên wî hene. Çapxaneya Şilêr 2 hezar kopî ji pirtûkê çapkirin û li beşdaran hatin belavkirin.

***ANHA***

# Tîma Rojava ya fotbolê di civîna salê ya li Awusturya de xebata xwe nirxand

**Tîma Rojava ya fotbolê li navenda xwe ya li paytexta Awusturya Viyana civîna xwe ya salê li dar xist. Di civînê de ku endamên tîmê û gelek piştgirên wê amade bûn, xebata îsal ya tîmê hat nirxandin û plana sala bê hat danîn.**

Bi rasthatina dawiya salê, tîma Rojava li navenda xwe ya li paytexta Awustura Viyanayê civîna salê bi beşdariya bi dehan endam û gelek piştgirên xwe li dar xist û tê de çalakiyên 2021'an nirxandin û plana sala nû danîn.

Perwerdekar Sened Romî, kabtin Şêx Muhacir û endamên rêveber ên tîmê Mistefa Mistefa, Behrî Ferho û Idrîs Hesen civîn bi rê ve bir.

Sened Romî bixêrhatina beşdaran kir û da zanîn ku di tîmê de 100 endamên ji tevahî pisporî û astan heye û wiha got: "Ji ber kedên ku tîm û endamên wê îsal dane de, di 13 maçan de bi ser ket û di nava tîmên Austria de gihaşt qonaxa dawî."

Romî teqez kir ku vê tîmê tevahî pêkhateyên Rojava, Sûriyê û dostên kurdistaniyên li derve li hev civand.

Di dawiyê de beşdaran rêbazên pêşxistina tîmê û piştevaniya guncaw ji tevahî aliyên madî û manewî ve ku hîna serkeftinên zêde pêk bîne û endaman zêde bike, nîqaş kirin.

**ANHA**



# Bi bendavan li dijî dîroka Kurdan



**Komeke arkeologan qaşo hewl dide li rojhilatê Kurdistanê şûnwar û bermayiyên çandeke kevnar ya Kurdistanê bi kolanên hewarê, biparêze.**

Komeke arkeologan qaşo hewl dide li rojhilatê Kurdistanê şûnwar û bermayiyên çandeke kevnar ya Kurdistanê bi kolanên hewarê, biparêze.

Tehlûkeya li ser vî şûnwarî projeyeke bendavê ye: Bendava Darî ya li Hewramanê. Lê ya ku ew wezîfedar kirine dewleta Îranê ye û ya ku bendavê çêdike jî heman dewlet e. Navê projeya wan jî Projeya Rizgarkirinê ya Dariyan e.

Rêveberê Giştî Ferîdûn Biglarî ye. Bendava devera Dariyan di navbera parêzgeha Kurdistan û Kirmaşanê de ye. Lêkolîna komê îsbat dike ku mirov li herêmê ji serdema Paleolitîka Navîn (binebeşeke serdema kevir a kevin e - beriya bi 30 hezar ta 300 hezar salan) heta îro her hebûne.

Di nava şûnwaran de 16 şikeft, gelek starên zinarîn, goristan û gund hene ku li ser çemên Sîrwan, Gerdelan û Jawaro ne. Xebero komê li van deveran kolan kirine û berhemên dîrokî derxistine.

Biya rêveberê projeyê Ferîdûn Biglari, ev kolanên arkeolojîk agahiyên yekser ên li ser serdema kevir a kevin didin. Lê her wiha li ser gundiyên destpêkê û herwiha sewalvanên destpêkê jî agahiyan didin. Xasma deverên şên û veşartina cenazeyan di serdema hesin de jî di encama lêkolînê de derketine holê. Yek ji van goran jî ya Ruwar e. Di encama lêkolînê de li ser zozanvaniya di serdema Îslamî de jî agahiyên berfireh hatine berhevkirin.

***ANF***

# Tîma filmê 'Dema Dirîreşka': Em xelatê qebûl nakin

**Tîma Fîlmê 'Dema Dirîreşkan' xelata festîvala fîlman ya Silêmaniyê red kir.**


Ekîba Filmê 'Dema Dirîreşka' ragihand ku wan weke helwesta li ser filma 'Ji bo Azadî' filma xwe ya 'Dema Dirîreşka' ji Festîvala 5'an ya Navneteweyî vekişandine. Lê derket holê ku festîvalê xelat daye fîlm. Ekîba fîlm ragihand ew xelatê qebûl nakin. Daxuyaniya Ekîba Fîlmê Dema Dirîreşkan wiha ye.

"Wekî ku tê zanîn, Komîna Film a Rojava beriya 4 rojan dabû xuyakirin ku Filmê 'Dema Dirîreşkan' ji Festîvala Silêmaniyê ya filman a Navneteweyî paş ve kişandiye. Ji bo ku fîlmê Ji bo Azadiyê ji hêla rêveberiya festîvalê ve hatiye astengkirin ev helwest hatiye nîşandan.


Me bihîst ku di merasîma xelatdayînê ya Festîvala Silêmaniyê de, filmê me 'Dema Dirîreşkan' xelata baştirîn Sînematografî bi dest xistiye! Tevî ku rêveberiya festîvalê dizanî ku fîlm ji festîvalê hatiye kişandin jî, dîsa rewşeke wisa derket. Em ekîpa film, vê xelatê qebûl nakin.

Neqebûlkirina vê xelatê jî ji ber ku ji devereke filmê 'Ji Bo Azadiyê' asteng kiriye, hatiye. Em vê yekê wekî helwesta xwe ya hunerî bi raya giştî re parve dikin. Em naxwazin tu festîvalên Kurdî tawanbar bibin lê tu filmên Kurdî jî gerek li tu festîvalên Kurdî, neyên asteng û qedexe kirin! Ev rexne û helwesta me ya hunerî ye."

***ANF***




## Nameyek ji Dayîkên Kurd re



Sîpan Şînda

Dayîkên delal, ev e sed sal in hûn di nava kul û derd, êş û eleman de heliyan. Ez dizanim ku çi gotin wê êşa ku we kişandî nikaribe bîne ziman. We kur xwedî kirin, mezin kirin û anîn li ber jin anînê, li ber kedê û dagirkeran ew li ber çavên we qetil kirin. We keç mezin kirin, anîn li ber mêrkirinê û li ber kedê dijminan ew ji li ber çavên we kuştin. We mal çêkirin, cihazên bûk û zavan danîn li ser hev lê dijmin hatin ew cihazên we yên ku we bi hêviyên gelekî xweş çêkiribûn bi xaniyên we ve bi dehan caran şewitandin. Gelo hûnê wan zarokên ku we di pêsîra xwe de bi delalî mezin kirîn, bi loriyan di mehdikê de hejandîn û kamil û baliq kirîn û paşê ji aliyê dagirkeran ve hatîn qetil kirin jibîr bikin? Gelo ez kîjan çîrokên we yên dilşewat bêjim? Ez dizanim her dayîkek ji we çîroka wê ji ya din dilşewattire. Ez dizanim ew berxikên we yên dermale kirîn çiqas li ber dilê we şirîn bûn. Ez dizanim, ew hineya ku we ji şeva destreşê re û ji zavatiya wan delalan re cebilandî hê ji di teştê de ye û finda wê ji ne vemiriye. Ez dizanim, hesp û mehîn zînkirî bûn û xêlîvan li ser rêketinê bûn, lê belê dijminan tilîliyên we di nîvî de hêlan, cendekê zavayî di milekê de qulipadin û yê bîkê ji di milê din de.

Dayîkên delal, ez dizanim hûn hingî şev serê xwe bi kul û keseran datînin li ser balgehî û heroj ji bi wan kul keseran dest bi rojê dikîn. Ji aliyekê ve kul û derdên debara jiyanê, ji aliyekê ve xema zar û zêçan û ji aliyê din ve xema herî mezin, bindestî. Eve sed sal in hûna di nava têkişîna azadiyê de ne. Eve sed sal in hûna tekoşîna parastina çand û zimanê xwe didîn. Lê mixabin îro bi taybetî li Bakûrê Kurdistanê û li Ewropa hewe dev ji vê tekoşîna parastina ziman berdaye. Hûn ji polîtîk bûne û zarokên we êdî nema dibêjin we "Yadê!" Zarokên we dibêjin we "ana!". Erê, we "Yadê" kuştiye û şûna wê ji "ana" rakiriye. Sed heyf û mixabin êdî hûn dayîkên Kurd zarokên xwe bi zimanê qatilê xwe mezin dikin. Hûn çand û hişmendiya wan didine zarokên xwe. Hûn êdî nema loriyan, mamikan, hikayetan ji zarokên xwe re bi Kurdî dibêjin. Hûn wan êdî ne bi "xezalûk û delalûkê", bi "keçelûkî" û "tehtê tehtê" mezin dikîn, hûn wan êdî bi "keloglan" û "cin Ali" û nizanim çi û çi mezin dikîn.

Dayîkên delal, ez dizanim hûn vêya henê ne bi zanebûn dikin. Ez dizanim ku pirrên we ne di hişmendiya girîngiya zimanê zikmakî ya ji bo zarokan de ye. Lê belê ew zimanê ku ew zarok hêj di zikê diya xwe de dest pê dikin û fêr dibin, ji bû pêşeroja wan kilîla serkeftinê ye. Ew zarok wê bi wî zimanî xwe nas bikin û bidine naskirin. Hûn dizanin ku me Kurdan çi dewlet nîne, çi saziyên ku zimanê me ji biparêze nîne. Dewleta me ji û saziya parastina zimanê me ji hûn dayîkin. Heke hûn ji vê "bêbextiyê" li zarokên me bikin, gelo sibê hûnê çi bersivê bidine wan? Dema ew mezin bûn û zanîn ku ew Kurdin, lê belê Kurdî nizanin, gelo hûnê vê çawa li wan bidine fêmkirin?

Dayîkên delal, hûn bidine xatirê delalên dilê xwe, hûn bidine xatirê kêl û gorên birîn ne kewandiyên xwe hûn zimanê xwe nîşanî zarokên xwe bikin, bi Kurdî bi zarokên xwe re biaxivin. Çawa dayîka xelkê nabe dayîka mirovî, zimanê xelkê ji nabe zimanê mirovî. Bi rêzdarî ez tême destên we.

# Destkeftiyên tenduristî û projeyên xizmetgûzariyê yên Rêveberiya Xweser yên 2021'ê

**Rêveberiya Xweser ya bakur û rojhilatê Sûriyê 2021'ê, tevî gelek astengiyan, gelek projeyên xizmetgûzarî yên girîng, mîna avakirina navendên tenduristiyê, vekirina riyên stratejîk û piştgiriya beşên çandinî û aboriyê pêk anîn.**




**LI SER ASTA XIZMETGÛZARÎ Û BINESAZIYÊ:**

Di 2021'ê de Desteya Rêveberiyên Herêmî û Şaredariyan gelek projeyên girîng ji bo piştevniya binesaziya herêmê pêk anîn. Bi wê re 280 proje ji bo sererastkirina pire û rîgaran hatin avakirin. 585 projeyên amadekirina rêyan bi xîzê pêk anîne. Her wiha 86 projeyên qîrkirina rêyan çêkirin. Ji wan jî sererastkirina rêya (Ebyed-Ebyed) a di navbera herêma Cizîrê û Firatê de di 27'ê Cotmehê de. Ev rê tevahî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi hev re girê dide.

Her wiha Desteya Rêveberiyên Herêmî û Şaredariyan 394 projeyên restorekirina torên avê û 14 projeyên sererastkirina stasyonên avê pêk anîn.

Ji projeyên girîng ên Desteya Rêveberiyên Herêmî û Şaredariyan pêk anîne:

Di 14'ê Çileyê de û bi lêçûna milyonek û 500 hezar dolar Rêveberiya Xweser dest bi projeya kişandina avê ji çemê Firatê kir. Ev proje wek çareyeke lezgîn ji dêvla stasyona ava Elokê ya Hesekê ku dagirkeriya Tirk û çeteyên wê kontrol dikin pêk hat. Ev yek li gorî gelek merheleyan bi rêya sererastkirina stasyona 47'an û stasyona Elwa, sererastkirina toreyên avê, projeyên dayîna kerhebê ji stasyonan re pêk hat. Bi wê re ji sedî 20 av ji şêniyên Hesekê re hat dabînkirin.

Di 19'ê Çileyê de, Şaredariya Gel a herêma Layiz a girêdayî bajarokê Geranîc ê rojhilatê Dêrazorê stasyona avê ji bo 120 hezar şênî ava kir. Di projeyê de xebat li ser avakirina hîm, dîwar, ode û dîwarên stasyonê hatin kirin û ev proje di 7'ê Sibatê de kete miryetê.

Di 26'ê Gulanê de Desteya Rêveberiyên Herêmî û Şaredariyan a herêma Cizîrê 3 projeyên ji bo cihên çopê ava kirin, ji wan projeyan vekirina projeya komkirina çopê li rojhilatê Qamişlo û veguhastina ber bi çopgeha bingehîn a li Holê ve.

Di 3'yê Hezîranê de, Yekitiya Avê ya Hecînê xeta avê ya nû ji 6 hezar şêniyên li 5 taxên Hecînê ava kir, her wiha nexweşxane ava kir. Di heman dîrokê de Desteya Rêveberiyên Herêmî û Şaredariyan projeya sererastkirina stasyona ava Baxozê ku ji xizmetê derketibû, ava kir. Ji ber dewleta Tirk a dagirker ava çemê Firatê qut kiribû û bandora wê li şêniyan dikir. Ev stasyon avê dide nêzî 45 hezar şênî ku li taxên Şêx Hemed, Dawûd, Mitlewîn, Xenafire, Elawîn, Şirîde û Şehabat in.

Di 11'ê Tebaxê de stasyona avê ya Sefafine ji bo dayîna avê ji 15 hezar şêniyên li 3 taxên rojhilatê Dêrazorê kete pratîkê.

Di 23'yê Tebaxê de Gerînendetiya Giştî ya Avê 5 bîrên avê li herêma başûrê Hesekê li seranserî xeta kişandina avê ji Firatê ava kirin, ji Mergede ber bi Erîşa ve. Da ku xwesteka şêniyên herêmê dabîn bike. Ji ber dewleta Tirk a dagirker ava stasyona Elokê ku av dida Hesekê qut kir.

Di 15'ê Îlonê de, şaredariyên Meclisa Sivîl a Dêrazorê dest bi xebatên projeya stasyona paqijkirina ava vexwarinê li rojhilatê bajarokê Keşkîşe kir. Ev proje bi rûbera hezar û 200 mitreçargoşe li ser keviya çemê Firatê ye û ev stasyona duyemîn li bajarok e û xizmeta nêzî 30 hezar şênîyî dike.

Di 7'yê Mijdarê de Rêveberiya Xweser a herêma Cizîrê jinûve dest bi sererastkirina stasyonên avê yên li başûrê Hesekê kir. Tê payîn ku her du proje di Sibata bê de bikevin xizmetê. Da ku pêdivî û xwestekên şêniyên herêmê dabîn bikin. Li gorî çavdêrên li ser projeyê û Şaredariya Gel a Şedadê ev proje pêdiviyên 160 hezar şênî li 350 gund û bajarokên navçeya Şedadê û Mergede dabîn dikin.

Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê 271 hezar û 605 dar li tevahî herêmên Rêveberiya Xweser çandin, 178 park sererastkirin û vekirin, 10 şitilgeh ava kirin.

**LI SER ASTA TENDURISTIYÊ:**

Ji girîngtirîn xebatên ku Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê li ser asta tenduristiyê kirine, sererastkirina nexweşxaneyên li herêmên Rêveberiya Xweser.

Di 7'ê Gulanê de Nexweşxaneya Firatê ya Giştî li bajarokê Ebû Hemam a rojhilatê Dêrazorê hat avakirin. Ji ber di dema serweriya çeteyên DAIŞ'ê de binesazî hatibû wêrankirin. Ev nexweşxane ya yekemîn li xeta rojhilat e û xizmeta zêdetirî 600 hezar şêniyan dike.

Ji wê zêdetir jî stasyonên dayîna oksojînê li tevahî rêveberiyên xweser û sivîl hatin dabînkirin. Di 9'ê Sibatê de Komîteya Tenduristiyê ya Meclisa Sivîl a Dêrazorê kargeha oksojîna tenduristî li herêma Sebe Kîlo li rojavayê Dêrazorê ava kir. Di rojê de kargeh 90 cereyên oskojînê derdixe.

Wek gaveke geşkirina rêbazên pêşîlêgirtina vîrusa Korona û dermankirina birîndaran, Desteya Tenduristiyê di 20'ê Kanûna 2020'an de navenda Jiyan-COVID-19'an ji bo dermankirina pêketiyên vîrosa Koronayê vekir. Ew navend di 18'ê Sibata îsal de kete meriyetê.

Di 28'ê Sibatê de ji bo sivikkirina barên nexweşan û lêçûna tenduristiyê li ser şêniyan, saziyên civaka sivîl klînîkên gel vekirin. Ev proje ya yekemîn li Qamişloyê ye û tê de 10 beş hene; hundirîn, jin, sinir, zarok û pisporiyên guh, poz û zengilor, mêzok, gurçik, dil, hestî û nûjdarî. Her wiha di wan klînîkan de klînîkên diran, laborator, radyolojî, dermanxane û odeya ambulancê hene.

Di 3'yê Nîsanê de, nexweşxaneya Kobanê bi piştevaniya Desteya Tenduristiyê ya herêma Firatê beşa emeliyetên dil vekir û di sibeha 8'ê Nîsanê de yekemîn emeliyeta dil li nexweşxaneyê ji jineke 54 salî re bi serketî hat çêkirin.

Ji bo peydakirina piştevaniya tenduristî ji zarokên pitik re, desteya tenduristiyê di 4'ê Tîrmehê de beşa kreşan ji zarokan re li Nexweşxaneya Gel a Amûdê vekir û tê de zarokên pitik bê pere tên dermankirin. Ev nexweşxane barên lêçûnên zêde û rûberên dirêj li ser şêniyan radike.

Beriya 2 salan Nexweşxaneya Dil û Çavan hat vekirin, di 10'ê Tîrmehê de yekemîn emeliyetên dil hatin çêkirin ku li ser astên Bakur û Rojhilatê Sûriyê yên yekemîn e û li ser asta Sûriyê ya herî baş e.

Desteya tenduristiyê alava radyolojiyê û pêdiviyên tenduristiyê ji hin nexweşxaneyan re peyda kirin. Her wiha di 13'yê Tîrmehê de Nexweşxaneya Wetenî ya Reqayê 2 beş zêde kirin, ew jî laboratora navendî û radyolojî ne.

Desteya Tenduristiyê ya herêma Efrînê di 2'yê Mijdarê de peymangeha tenduristiyê li kantona Şehbayê vekir, yekemîn peymangeha tenduristî di 25'ê Cotmehê de li Hesekê hat vekirin û 35 xwendekar hatin qebûlkirin.

**DI QADA PERWERDE Û FÊRKIRINÊ DE**

20`ê Çileyê 900 xwendekarên dibistanên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ezmûnên werza yekemîn a sala 2020-2021`ê li 4 hezar û 92 dibistanan pêk anîn.

28`ê Tîrmehê Desteya Perwerde û Fêrikirinê ya Rêveberiya Xweser a Herêma Cizîrê beşên çandinî, pîşesazî û bazirganiyê li qada perwerdê zêde kirin.

5`ê Tebaxê Zanîngeha Kobanê 7 beşên nû vekir da îsal hîn zêdetir xwendekaran pêşwazî bike, ji wan Fakulteya Wêjeya Erebî ku 4 sal in, peymangeha Zanistên Perwerdê 2 sal e û ji van madeyan pêk tê Erdnîgarî, Mamostetiya Refê, Wêjeya Îngilîzî, her wiha peymangeha Zanistên Qanûnî û Îdarî, Peymangeha Tiqenî ku ji şaxê Kehreba û Mîkanîkê pêk tê û dê li Bendava Rojava (Tişrînê) were vekirin.

Peymangeha Tibê ku berî niha ji taqîgehekê pêk dihat, tê pêşxistin, niha beşên razanê (Texdîr) û hemşîre lê zêde bûn û di sala yekemîn de jî dê bi peymangeha Tiqenî re hevbeş be û di sala duyemîn de dê pisportî çêbibe.

17`ê Îlonê Komîteya Perwerde û Fêrkirinê ya Civaka Demokratîk li Helebê ji bo 600 xwendekaran yekemîn dibistana ku meteryalên Rêveberiya Xweser lê dihat dayîn, vekir û hîn jî xwendekarên Ereb û Kurd navên xwe tomar dikin.

28`ê Cotmehê 640 xwendekar piştî 4 salan ji xwendinê ji zanîngeha Kobanê derçûn.

31`ê Cotmehê 581 xwendekar ji zanîngeha Rojava derçûn.

27`ê Mijdarê Koordînasyona Zanîngehên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Zanîngeha Şerq a Reqayê vekir.

**SOTEMENÎ**

Daîreya Sotemeniyê 1, 052, 884, 062 lître mazot ku dike derdora 4 milyon û 785 hezar û 836 berîmîl mazot ji bo xizmetê, nivîsgehên veguhestinê, pîşesazî û çandiniyê belav kir. Her wiha 19 hezar û 974 bermîl li 10 hezar û 271 malbatên şehîdan belav kir, 2 hezar û 845 bermîl mazot bê pere li dibistanan belav kir û 3 milyon û 991 hezar û 656 cereyên (top) gazê belav kir. Ji bo her malbatekê 440 lître mazota germkirinê belav kir.

**QADA ABORÎ Û ÇANDINIYÊ**

8`ê Cotmeha 2020`an Komîteya Aborî ya Meclisa Sivîl a Reqayê projeya ziwakirina garisê zer bi dawî kir. Projeyê di saetekê de 45 ton derdixist û 310 hezar dolar lê diçû. 16`ê Çileyê jî ziwakirina hilberînên cotkarên Reqayê bi dawî kir û miqdarê ku heta niha hatiye ziwakirin gihaşt 20 hezar ton, hezar û 170 kart gihaştin cotkaran û wan veguhestin Şîrketa Pêşxistina Civaka Çandiniyê ya Reqayê. Di heman demê de rojane ji 600 heta 700 tonî ziwa dikir.

26`ê Çileyê Desteya Aborî ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi çavdêriya Şîrketa Hesen yekemîn kargeha Zeytê vekir. Lêçûna kargeh 6 milyon bû û dê rojane 300 ton zeyt derxe.

14`ê Hezîranê Meclisa Sivîl a Reqayê li herêma Seba Kîlo ya gundewarê Dêrazorê yekemîn kargeha xwê vekir û rojane derdora 8 ton xwê derdixe. Kargeh 1`ê Nîsanê hate xebitandin û wekî yekemîn kargeh tê dîtin. Rûbera kargehê jî 4 donim e û hejmara karkerên lê dixebitin 20 e.

27`ê Hezîranê hejmareke bazirganan pêşangeha makîneyên pîşesaziyê û alavan vekir ku ji makîneyên taybet bi dagirtina baqil, şîr, zatir û şerbeta toz pêk tê, her wiha ji madeyên tibî û makîneyên taybet bi stampên destan û nîvotomatîk û otomatîk û alava derziya kişandina ba, alavên çêkirina şirûbên cemidî ku bi tevahî ji Çînê hatine.

19`ê Cotmehê endamên Meclisa Giştî ya Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê reşnivîsa projeya Qanûna Parastina Erdên Çandiniyê û Mizaxtkirinê wan mohr kir û qanûn bo hemû kesên muxalif danîn.

15`ê Mijdarê û piştî 3 sal di ser berxwedana Şehbayê re derbas bûn, her wiha ruxmî zor û zehmetiyên di demsalên havîn û zivistanê de dikişînin û rêxistinên qaşo bi kar û barên koçberan radibin, nebûn alîkar, bi armanca pêşîlêgirtina bêkariyê li kantonê yekemîn kargeha çêkirina soba hate vekirin.

Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi rêjeya di navbera ji sedî 108-150 fonên xebatkarên Rêveberiya Xweser zêde kir.

***ANHA***



# Jimara şehîdên bombeberana li Kobanê gihîşt 5'an

**Di êrişa êvara Şemiyê de ya ji aliyê dewleta Tirkan ya dagîrker ve li Kobanê hatî kirin jimara şehîdan gihîşt 5 kesan.**

Êvara Şemiyê balafirên bêmirov yên biçek yên dewleta Tirk li Kobanê êriş pêkanîbû, di encamê 2 welatî şehîd bûbûn û 7 kes jî birîndar bûbûn.

Li gorî agahiyên ku ji Meclisa Malbata Şehîdan a Kobanê hate girtin, ji hemwelatiyê ku di êrişê de birîndar bibûn û li nexweşxanê dihatin dermankirin 3 ji wan jî rexmî hemû mûdaxaleyên bijîşkan şehîd ketin.

Li gorî van agahiyan hejmara hemwelatiyên ku di encama êrişa de şehîd bûn gihîşt 5 kesan. 4 hemwelatiyên ku birîndarin jî li nexweşxanê tên dermankirin. Navên şehîdan ev in: Nûjiyan Ocalan, Viyan Kobanê, Rojîn Ehmed Îsa, Merhef Xelîl Îbrahîm û Welîd Menla Hisên.

***ANHA***




# Çalakvanên Sêmalka banga radestkirina cenazeyên şehîdan kirin

**Çalakvanên li Sêmalka nedana PDK`ê ya cenazeyên 5 şehîdan şermezar kirin û bang li PDK`ê kirin ku li şûna deriyê Pêşxabûr û El-Welîd bigire, divê cenazeyên şehîdan radestî malbatên wan bike.**

Konê çalakiyê li deriyê Sêmalkayê ku ji aliyê Meclisa Malbatên Şehîdan a herêma Cizîrê ve hate dayîn di roja 86`an de didome. Konê çalakiyê ji ber neradestkirina cenazeyên gerîlayên ku di kemîna hêzên PDK`ê de li herêma Xelîfanê hatiye dayîn.

Îro endamên yekitiyên girêdayên TEV-DEM`ê yên Qamişlo berê xwe dan konê çalakiyê li deriyê Sêmalkayê û di nava dirûşmeyan de berê xwe dan deriyê Pêşxabûrê. Li deriyê Pêşxabûrê hêzên sînor ên girêdayî PDK`ê hêzên xwe xurt kirin.

Li deriyê Pêşxabûr ji rêveberên TEV-DEM`ê li Qamişlo Ayid Îbrahîm wiha axivî: "Em bang li berpirsên hikûmeta Başûrê Kurdistanê dikin ku cenazeyên şehîdan radestî malbatên wan bikin."

Îbrahîm destnîşan kir ku çalakiya li Sêmalkayê di roja 83`an didome, lê PKD`ê red dike ku cenazeyê şehîdan radest bike û wiha domand: "Li şûna ku PDK`ê bersiva çalakvan û ciwanan di meşa wan a aştiyane de bide, yekser deriyê Sêmalkayê girt."

Îbrahîm wiha domand: "PDK`ê banga ciwanan pêk neanî bi keviran êrişî wan kir û bi hincetên derew deriyê Sêmalka û El-Welîd girt. Kiryarên bi vî awayê xizmeta dijminê gelê Kurd dike ku dixwaze destkeftiyên ku bi saya xwîna şehîdan hatine bidestxistin, têk bibe."



Îbrahîm wiha dawî li axaftina xwe anî: "PDK`ê û dewleta Tirk a dagirker dixwazin bi rêya planên xwe yên qirêj destkeftiyên gelê Kurd tune bikin."

***ANHA***

# Nasnameya gerîlayeke YJA Starê hat eşkerekirin

**HPG'ê bi daxuyaniyeke nivîskî nasnameya gerîlayeke YJA Starê ku li Bagokê şehîd bûbû, eşkere kir.**

Daxuyaniya Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê wiha ye: "Artêşa Tirkan ya dagirker ji destpêka meha Kanûnê ve li eyaleta Mêrdînê dest bi operasyonên berfireh kir. Di dema van operasyonan de ku bi rojan dewam kir kampek ji 6 hevrêyên me yên jin kete şer û 2 rojan li vê qadê şerekî giran qewimî. Hevrêyên me yên jin bi pêşengiya fermandara herêmê hevrê Hîra berxwedaneke destanî nîşan dan û sekna teslîmnegirtî ya jinên Kurd bi rengekî lehengî temsîl kirin. Di vî şerî de 6 hevrêyên me yên jin ên bi ruhê Apoyî yê bilind şer kirin, şehîd bûn. Eşkere bû ku du ji hevrêyên me yên şehîd bûne Hîra Ûlaş û Sîmanûr Kaya ne. Agahiyên berfireh ên nasnaneyên hevrêyên me yên din piştî ku diyar bûn wê bi raya giştî û gelê mê re bêne parvekirin.



Agahiyên li ser nasnameya hevrêya me Hîra wiha ye:

Nasnav: Hîra Ûlaş

Nav paşnav: Denîz Orak

Cihê jidayikbûnê: Mêrdîn

Dayik-Bav: Çîçek-Huseyîn

Dem û cihê şehadetê: 15'ê Kanûna 2021 / Mêrdîn

***ANHA***

# Ciwanên Tebqa, Reqa û Dêrazorê komkujiya dewleta tirkî ya li Kobanê şermezar kirin

**Li Tebqa, Reqa û Dêrezorê Yekîtiya Jinên Ciwan û Tevgera Ciwanên Şoreşger yên Sûriyê bi daxuyaniyên cuda bombebarana dewleta tirkî yaa dagîrker ya li Kobanê şermezar kirin.**

Daxuyanî ji aliyê endama rêveber a Meclisa Ciwanên Reqayê Buşra El-Nayif ve hate xwendin. Di daxuyaniyê de hate gotin, armanca dewletên emperyalîst ew e ku îradeya azad û berxwedana gelan têk bibe da ku têkçûna xwe ya siyasî û aborî veşêre. Êrişên li ser Zirgan, Til Temir, Şengal û malbata Gulo ya li Qamişlo nîşana vê yekê ye.

Di daxuyaniyê de êrişên "Nemerdane" yên dewleta Tirk hatin şermezarkirin û wiha hate gotin: "Em careke din dubare dikin û dibêjin em van êrişên dagirkeriyê yên hovane şermezar dikin û dibêjin em ê li hember her çete û xayînên ku destê wan di van sûcan de heye têk bibin."

**DÊRAZOR**

Li bajarê Dêrazorê bi amadebûna hemû endamên Meclisa Jinan û Meclisa Ciwanan a herêma rojhilat, Tevgera Ciwanên Şoreşger ên Sûriyê li gundewarên rojhilatê Dêrazorê êrişên dewleta Tirk a dagirker şermezar kirin.

Daxuyanî ji aliyê endama Meclisa Jinan a herêma rojhilat Efaf Hemûd El-Hemed ve hate xwendin û hate gotin: "Ev êriş lawazbûna dagirkeriyê nîşan dide û wê îrade û berxwedana me mezintir bike."

Di daxuyaniyê de wiha hate domandin: "Em wekî ciwan û gelê herêma rojhilatê Dêrazorê ji faşîzma Tirk û çeteyên wê re dibêjin, êrişên we nîşana lewazî û tevliheviya we ye, ew êriş her wiha îradeya me û ruhê berxwedanê zêde kiriye."

**TEBQA**

Bi amadebûna hejmarek endamên Tevgera Ciwanên Şoreşger ên Sûriyê, Yekitiya Jinên Ciwan û hejmarek ji endamên Nivîsgeha Kombûna Jinan a Zenûbya ya Tebqayê, daxuyanî li pêşiya navenda Ciwanên Şoreşger a li navenda bajêr ji aliyê rêveberekî Tevgera Ciwanan Ebdulqadir El-Telcî ve hate xwendin. Di daxuyaniyê de wiha hate got:

"Bi navê Tevgera Ciwanên Şoreşger û Yekitiya Jinên Ciwan a herêma Tebqayê, em êrişa duh a li bajarê Kobanê ji aliyê balafirên bêmirov ên dewleta Tirk ve ku di encamê de sivîl hatin qetilkirin û birîndar bûn, şermezar dikin. Ev êrişên dubare binpêkirina eşkere ya peymanên navneteweyî yên li herêmê."

Armanca Tirkiyê ya ji van êrişan ew e ku gel qels bike û DAIŞ'ê vegerîne Bakur û Rojhilatê Sûriyê, bi paşguhkirina navneteweyî ya van sûcan, lê ev plan hemû li ber îradeya gelên herêmê yên ku li pey fikir û felsefeya neteweya demokratîk, wê têk biçin."

Em wekî Tevgera Ciwanên Şoreşger û Yekitiya Jinên Ciwan hemû destwerdana li ser axa me şermezar dikin û em ê li hemberî hemû planên dagirkeriyê û pêşketinên leşkerî hişyar bin, heta em vê dagirkeriyê ji nava xwe derxin em ê hemû sûcên Erdogan û çeteyên wî eşkere bikin."

***ANHA***







# Rêveberiya Xweser ya Firatê: Dewleta Tirkan dixwaze li dijî Kurdan qirkirineke nû bike

***Rêveberiya Xweser ya herêma Firatê diyar kir ku êrişên dewleta Tirkan yên ser bakur û rojhilatê Sûriyê projeya demokratîk dike amanc û hewl dide gelê Kurd qir bike.***

Li gorî daxuyaniya Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweser a herêma Firatê ku li ser rûpela xwe ya fermî weşand ku, balafirkeke bêmirov ya dewleta Tirkan malek li rojhilatê bajarê Kobanê bombebaran kir û di encama wê de du welatî şehîd bûn û 7 jî birîndar bûn.

Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweser têkildarî êrişê daxuyaniyek li pêşiya avahiya meclisê li Kobanê da û êrişa dewleta Tirk şermezar kir.

Daxuyanî ji aliyê Cîgirê Hevserokatiya Meclisa Rêveber a Herêma Firatê Nîhad Ehmed ve hate xwendin. Di daxuyaniyê de hate diyarkirin ku dewleta Tirk hewl dide qirkirineke nû li dijî gelê Kurd û projeya demokratîk li Bakur û Rojhilatê Sûriyê pêk bînê, her wiha destnîşan kir ku rêjeya êrişên dewleta Tirk zêde bûne, di demekê de ku projeya hevbeş a di navbera pêkhateyan de biser dikeve û ji hêviya cîhanê re bûye hêvî.



Her wiha hate gotin, diyar e ku AKP`ê gihaştiye rêyeke girtî û dixwaze bi rêya êrişan çavan ji ser aloziya xwe ya aborî di hundir, bigre.

Di dawiya daxuyaniyê de bang li civaka naveteweyî û dewletên garanetor hate kirin ku şer li Bakur û Rojhilatê Sûriyê rawestînin, rola xwe di sekinandina hovîtiya dewleta Tirk de bisekinin da ku bi hevre ewlehî û aramiya herêmê biparêzin.

Hêjayî bi bîrxistinê ye ku balafirên bê mirov ên dewleta Tirk di 20 – 23`1ê Cotmeha borî de du navendên li bajarê Kobanê bombebaran kir û di encama wê de 5 welatî şehîd bûn û 3 jî birîndar bûn.

***ANHA***

# "Ji bo ku gel bertekan nîşanî Rêveberiya Xweser bide deriyên sînor girtin"

**Siyasetmedarên bakur û rojhilatê Sûriyê dan zanîn ku girtina deriyê Pêşxabûr û Welîd karteke derexlaqî û dermirovî ye û gotin, ev biryar dikeve xizmeta dijminê gelê Kurd û bandoreke neyînî li têkiliyên Kurdistanê dike.**



Ji beriya sê mehan ve Meclisa Malbatên Şehîdan a herêma Cizîrê li pêşiya deriyê Sêmalkayê banga wergirtina cenazeyên gerîlayên HPG`ê li PDK`ê dikin. Niha jî deriyên di navbera Başûrê Kurdistanê û herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê girtî ne.

PDK`ê roja yekşema borî deriyê Welîd ê girêdayî Başûrê Kurdistanê yê li hemberî deriyê Siwêdiyê yê herêma Koçerat a girêdayî navçeya Dêrikê girt. Beriya ku derî bigire bi rojekê jî deriyê Pêşxabûr a li hemberî deriyê Sêmalkayê ya Rojava girtibû.

Li gorî îdiayên PDK`ê, ji ber çalakiya konvedanê ya dayikên şehîdan û xwepêşandana aştiyane ya ciwanan a banga wergirtina cenazeyên gerîlayên HPG`ê, her du derî hatine girtin. Gerîlayên HPG`ê 28`ê Tebaxê li herêma Xelîfan a Başûrê Kurdistanê di encama kemîna PDK`ê de şehdîd ketin e.

Têkildarî girtina deriyên Pêşxabûr û Welîd siyasetmedaran ji ANHA`yê re destnîşan kir ku ev kiryar xizmeta dijminê gelê Kurd di serî de dewleta Tirk a dagirker, dike.

Serokê Nivîsgeha Kongreya Neteweyî ya Kuridstanê (KNK) Silêman Hec Elî girtina deriyan wekî sûcekî dermirovî yê li dijî gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi nav kir û wiha got: "Li dewletan, di dema rageşî û şer çêbibin de ji bo gel korîdorên mirovî hene û deriyê Sêmalkayê ji bo gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê dergeheke mirovî ye, ji lew re girtina wî ji bo gelê herêmê wekî sûcekî ye."

Silêman Hec Elî destnîşan kir ku malbatên şehîdan mafdar in, ji beriya 3 mehan ve banga wergirtina cenazeyên ciwanên xwe yên şehîd dikin, ji lew re ew ê piştevanên xwepêşandêran bin. Hec Elî dibêje ku çawa dibe hikumete ke ku aleke kurdî radike û cenazeyên gerîlayên Kurd jî nade malbatên wan û dibêje ew li hember biryareke wisa mat maye.

Hec Elî da zanîn ku bihaneyên PDK`ê yên li ser xwepêşandanên aştiyane yêN ciwanan ne rewa ne û isbat dikin ku li dijî herêmê bi Tirkiyê re hevpeyman datînin.

Endamê Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD) Nûman Erebo siyaseta PDK`ê û girtina deriyan bi derexlaqî û dermirovî bi nav kir û ev li gotina xwe zêde kir: "Bi rêya diyalogan nakokî dihatin çareserkirin ne bi rêya ferzkirina ambargoya li ser herêmê û cezakirina gel."

Erebo da zanîn ku girtina deriyên Sêmalkayê û Welîd li ser perspektîfên dewleta Tirk a dagirker pêk hat, ji ber ku di aliyê leşkerî de nekarî projeya Rêveberiya Xweser têk bibe û bi wê re hewl dide li herêmê şerê aborî bimeşîne, ji lew re PDK`ê bi kar tîne, da ku girseya gel li dijî Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê serî hilde û projeya wê têk bibe.

Nûman Erebo diyar kir ku girtina deriyan ji hêla PDK'ê ve xizmeta dijminê gelê Kurd û berjewendiyên





wan dike, ev jî bandoreke neyênî li têkiliyên Kurdistanê dike û xizmeta yekitiya refa kurdî nake.

Serokê Nivîsgeha Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) îşaret pê kir ku hewldanên nû hene da ku zextê li Rêveberiya Xweser bikin û ew jî li gorî xizmeta wan tawîzan bike û ev tişt got: "Lê ev hemû kiryar komploya li dijî Rêveberiya Xweser e. Divê gel bi destkeftiyên şehîdan ve girêdayî be û li hember vê kompoloyê tê bikoşin."

Endamê PYD`ê Nûman Erebo têkildarî ambargoya li ser herêmê hatiye ferzkirin got, gelê herêmê gelek zor û zehmetî dîtin, lê dîsa jî bi vîn û berxwedana xwe her wiha bi parastina destkeftiyan dê hemû komployan têk bibe.

***ANHA***

# "Rêveveriya Xweser ne mecbûr e barê çeteyan hilgire û divê werin darizandin"



**Malbatên şehîdan gotin, divê malbatên çeteyên DAIŞ'ê ji bakur û rojhilatê Sûriyê werin derxistin û banga avakirina dadgeheke navneteweyî ji bo darizandina çeteyan li ser xaka bakur û rojhilatê Sûriyê kirin.**

Hevseroka Meclisa Malbatên Şehîdan Ayat Îbrahîm diyar kir ku kampa Holê ji kampên din cudatir e, ji ber ku tê de malbatên DAIŞ'ê yên herî tundraw hene.

Ayat Îbrahîm da zanîn ku şêniyên herêma başûrê Hesekê rastî û fikirên tundraw ên DAIŞ'ê baş dizanin û xeteriya wê hîna heye û wiha got: "Sûcên rojane, şewitandina konan, sûcên ku jinên DAIŞ'î pêk tînin, ji ber îmareteke biçûk di kampê de çêkirine. Bi wê re jin bîranînên hevjînên xwe diparêzin û ev yek jî li ser herêmê û cîhanê xeternak e."

Ayat Îbrahîm diyar kir ku jinên di beşa "Muhacîrat" a taybet bi malbatên DAIŞ'ê yên biyanî de,



dibistanên taybet ava kirin ku zarokên xwe li ser fikirê DAIŞ'ê perwerde bikin û 'saziya hesabdayîn' aktîf kirin da ku jinên perspektîfên wan pêk neynin celd bikin anku li wan bidin. Ayat Îbrahîm bang li cîhan û civaka navneteweyî kir ku berpirsiyarên xwe pêk bînin.

Ayat Îbrahîm got, divê dewletên ku hemwelatiyên wan di nava DAIŞ'ê de hebin berpirsyartiyên xwe bi cih bînin, hemwelatiyên xwe vegerînin, her wiha anî ziman ku divê dadgeheke navneteweyî ji bo darizandina çeteyên DAIŞ'ê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê were avakirin. Ayat Îbrahîm got, Rêveberiya Xweser ne mecbûr e malbatên çeteyan xwedî bike û berpirsiyariyên wan hilgirin.

Endamê Meclisa Malbatên Şehîdan



a Şedadê Elaa Selûm got: "Ji ber hebûna malbatên DAIŞ'ê li kampên herêmê bi taybet li kampa Holê şêniyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û Rêveberiya Xweser azarên mezin dikişînin. Ji ber ku di kampê de malbatên DAIŞ'ê hene û wan şêniyên herêmê qetil kirin û welat wêran kir."

Elaa Selûm got, divê civaka navneteweyî helwesteke rastîn û cidî têkildarî dosyaya DAIŞ'ê ji bo wergirtina welatiyên xwe de nîşan bide û li gorî qanûn û mîsaqên xwe darizîne û dadgeheke navneteweyî ya taybet bi darizandina çeteyan li herêmên Rêveberiya Xweser ava bike.

***ANHA***



Astana.... Kaniya wêraniya Sûriyê ye

**Dilyar Cizîrî**

Aloziya Sûriyê ji bo guhertina demokratîk dest pê kir. Roj bi roj pêla şoreşa gel mezin bû lê bi destwerdana hêzên derve yên wekî Tirkiyê, Îran û paşê Rûsiya û Amarîka şoreşa gel ji rê hate derxistin û komên çekdar ên bi hêzên derve ve girêdayî ketin dewarê.

Bi demê re ev destwerdan berûvajî û komên radîkal ên wekî DAIŞ û Cebhet El-Nusra jî di nava de bi dehan komên çekdar ên di xizmeta van welatan de hatin avakirin. Gelê Sûriyê yê ji bo azadiya xwe ket nava liv û tevegerê di nava koman de winda bû. Bi milyonan bûn qurbaniyên siyaset û bazarên dewletên derve û bi serî de Tirkiyê ku roleke neyînî ya bi bandor di xaka Sûriyê de lîst û hîn jî dilîze.

Wan welatan ji bo berjewendiyên xwe ketin nava pêşbirkê û her aliyekî ji wan planên xwe yên li ser hesabê gelê Sûriyê danîn û ji bo pêkanîna berjewendiyan ket nava liv û tevgerê.

Dewleta Tirk çavên xwe li pêkanîna Mîsaqa Milî vekir û ji bo wê beşek ji xaka Sûriyê agir kir û hîn jî di nava hewldanan de ye plana xwe bi cih bike. Ji ber berxwedana gelê kurd a li Rojava destpê kir û li tevahî Bakur û Rojhilatê Sûriyê li ser esasê biratiya gelan belav bû, dewleta Tirk hemû giraniya xwe ji bo têkbirina projeya demokratîk a herêmê xist dewrê.

Ji destpêka şoreş û heta niha bê navber êrîşên xwe li dijî ezmûna demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûriyê didomîne. Herî dawî jî êrîşa Kobanê ku bi balafirên bê mirov li dijî maleke sivîl pêk hat, beriya wê jî êrîşa li dijî Zirgan û Til Temirê û her wekî din, hema bêj rojane êrîş, kuştin û wêranî li dijî herêmê dike.

Îran jî ji aliyê xwe ve di nava hewldanan de ye li ser xaka Sûriyê alîgirên xwe bi cih bike û xeta bejahî di navber Iraq, Sûriyê û Lubanê veke, wiha jî xwe bighîne derya SPî, ji bo vê jî hemû hêza xwe xistiye dewrê û tevdigere.

Rûsiya jî ji bo berjewenndiyên xwe yên aborî û bi cih kirina projeyên wê yên aborî di xaka Sûriyê de planeke wê ya mezin heye. Ji bo pêkanîna wê gelek agvên mezin jî avêtine. Ji wan plana jî bargeh û bendên Sûriyê yên Rûsiya ji hikûmeta Şamê standine bi dehan e. Ji ber wê jî Rûsiya di her fersetê de parastina Hikûmeta Şamê û serokê wê Beşar El-Esed dike.

Hersî welatên me behsa wan kir, li ser xaka Sûriyê di nava liv û tevgerê de ne, her yek ji wan hewl dide para mezin a berjewendiyan ji Sûriyê sûd bigre. Îcar civînên Astana bi destê hersê welatan tên lidarxistin. Heta niha 17 car in civînên wan lidar ketine, di her civînekê de jî bazarek û zirarek li dijî gelê Sûriyê heye. Tişta balkêş jî ew e ku di hemû civînan de tiştekî nû ji bilî bazarên wan ên li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyayê nîne.

Di her civîneke Astana de bazarek û êrîşek li dijî Rêveberiya Xweser heye, di civîna 17'an de jî plana êrîşa li dijî Zirgan û Til Temir, her wiha êrîşa bi balafirên bê mirov a li dijî Kobanê jî hebû. Lê tişta nû bi zelalî di civîna 17'an de xuya kir, hersê alî êdî di bazaran de ber bi xetimînê ve çûne û dibe di demên pêş de aloziyên wan li ser erdê xweştir diyar bibin. Ev jî bi nîşandayîna cihê civîna 18'an diyar dibe. Tê payîn li Paytexta Îran Tehranê were lidarxistin. Ji vê jî diyar dibe, êdî hersê hêz nema dikarin nakokiyên xwe veşêrin. Ji lewra dibe di demên pêş de aloziya wan veguhezin şerekî leşkerî. Lê ne mumkine Astana tiştekî ji bilî wêraniyê ji gelê Sûriyê re bîne.



# KCK: Ji bo Roboskê divê têkoşîn bênavber dewam bike

**Hevserokatiya Konseya Rêveber ya KCK'ê 33 ciwanên Roboskî yên 28'ê Kanûna 2011'an bi balafirên şer yên dewleta Tirkan hatîn kuştin bîr anîn û got, divê ev têkoşîn bênavber dewam bike heta sûcdar bên darizandin.**



Hevserokatiya Konseya Rêveber ya KCK'ê bi pêmana salvegera Komkujiya Roboskê daxuyaniyek da. Di daxuyaniyê de hate wiha hat gotin: "Beriya niha bi 10 salan bi balafirên şer ên dewleta Tirk 33 ciwan û zarokên ji Roboskî bi bombardûmanê hatin qetilkirin. Em van ewladên gelê Kurd ên şehîd bûn bi bîr tînin, soza xwe dubare dikin ku ji bo dilsoziya bi bîranîna wan re em ê Kurdistaneke Azad ava bikin ku careke din çiya, deşt, gund û bajarên wê neyên bombekirin."

Di dewama daxuyaniya KCK'ê de wiha hat gotin:

"10 sal in berpirsyarên vê komkujiyê nayên dîtin û nayên cezakirin. Ev yek nîşaneya berçav a nêzîkatiya li gelê Kurd e. Feraseta dewleta Tirk wiha ye; Kurd dikarin bêne kuştin, li her derê zilm dikare li Kurdan bê kirin, destdirêjî li jinên Kurd dikare bê kirin, bi her awayî kiryarên li dijî mirovahiyê li Kurdan dikare bê kirin! Têkildarî sûcên li dijî Kurdan tê kirin polîtîkaya bêcezahiştinê tê meşandin. Pêwendiya vê zîhniyet û polîtîkayê bi polîtîkaya qirkirina Kurdan re heye. Dixwazin ku bi vî rengî Kurdan bitepisînin û ji têkoşîna azadiyê vegerînin. Ji gelê Kurd re tê gotin; 'Heta ku hûn serî li ber Tirkbûnê netewînin wê tiştên bi vî rengî bê serê we'. Balafirên ku bombe li 33 şêniyên Roboskî barandin ji cihekî ferman wergirtin. Sûcdarên herî mezin jî yên ku ev ferman dane. Ev ferman yekser ji aliyê Serokwezîrê wê demê Tayyîp Erdogan ve hatiye dayin. Ji Tayyîp Erdogan ev pirs hatiye pirsîn 'Konvoyeke qaçaxçiyan heye ku tê de terorîstek heye, em lê bidin yan na?' Tayyîp Erdogan jî gotiye, lê bidin. Ji ber vê yekê sûcdarên komkujiya Roboskî nayên darizandin. Hewl tê dayin ku qetilkirina 33 zarok û ciwanan weke ziyaneke şer bê nîşandan û jibîrkirin. Bi vî rengî Recep Tayyîp Erdogan bi destên xwe yên bi xwîn bi serbestî digere. Bêguman Erdogan ji qetilkirina bi hezara mirovî berpirsyar e. Di dema berxwedanên xwerêveberiyê de yê ku fermana hilweşandina bajarên Kurdan dabû Tayyîp Erdogan bi xwe ye.

Dewleta Tirk dewleteke welê dijminê Kurdan e ku yên komkujiyan dikin mehkeme nake, lê yên ku komkujiya Roboskî şermezar kirin girtin û darizandin. Di dîroka dewleta Tirk de nêzîkatiya li yên komkujî anîn serê gelê Kurd her tim bi vî rengî bû. Yên ku li Dersimê, li Zîlanê qirkirin, komkujî kirin nehatin cezakirin, yên ku fermana van komkujiyan dan nehatin mehkûmkirin; yên ku ev komkujî û qirkirin anîn ziman bi cihêkariyê hatin sûcdarkirin, darizandin û zindanîkirin.

Roboskî jî mîna komkujiyên Dersim û Zîlanê komkujiyeke ku rastiya dewleta Tirk bi rengekî şênber radixe pêş çavan. Dîmenê cenazeyên ku li ser pişta hêstiran li pey hev anîn gund wê ti carî ji bîra mirovan neçin; wê nikaribin vê komkujiyê bidin jibîrkirin. Erka xwe çi dibe bila bibe berpirsyarên vê komkujiyê wê teqez bêne cezakirin. Gelê Kurd jî, hêzên demokrasiyê jî divê li gel berxwedana bi rûmet a xelkê Roboskî bin, têkoşîna wan xurt bikin û kujeran derxînin pêşberî dadgehên gel.

Dayikên malbatên şehîdan 10 sal in têkoşîneke bi mînak dimeşînin. Divê gelê me û hêzên demokrasiyê piştgiriyê bidin vê têkoşîna dayikên şehîdan. Doza wan doza gelê Kurd û hêzên demokrasiyê ye. Heta ku kujer û berpirsyarên komkujiya Roboskî neyên dairzandin ne Kurdistan dikare azad bibe, ne jî Tirkiye dikare demokratîk bibe. Di serî de darizandina sûcdarên hemû komkujiyan bi taybetî komkujiya Roboskî, parçeyekî bingehîn ê têkoşîna azadî û demokrasiyê ye. Ji ber vê yekê divê heta sûcdar bên darizandin ev têkoşîn bênavber bê dewamkirin."

***ANF***

# Xistina PKK ya "lîsteya terorê" kiryareke dermirovî ye

**Jiyan Ebas/Qamişlo**

**Welatparêzê ji bajarê Qamişlo Rêber Gulo diyar kir ku PKK doza azadiya gelan dike û got, xistina PKK ya "lîsteya terorê" bêbextiyeke mezin e, divê gelê Kurd vê qebûl neke.**

Bangên rewşenbîr, nivîskar û gelên cîhanê li ser derxistina Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) ji "lîsteya terorê" dewam dikin.

Derbarê mijarê de ji welatparêzên bajarê Qamişlo Rêber Gulo wiha axivî: "Dewletên serdest û yên herêmî bi vê bêbextiyê li hemberî PKKê ku demokrasî, edalet û wekheviyê ji gelan û tevahiya mirovan re dixwaze, sûcê mirovayiyê dikin."

Rêber Gulo diyar kir ku sala 1985`an de PKK nas kiriye û wiha got: "Berî naskirina PKK`ê peywendiyên me bi gelek partiyên din yên kurdî re hebûn, tevî ku em wekî endamên wan partiyan bûn jî, me nizanîbû ka ew partî çi karî dikin."

Rêber Gulo di mijara cudayiya navbera partiyên kurdî û PKK`ê de da zanîn ku gel li hemberî partiyên din bêbawer bû, lê bi naskirina PKK`ê rewş guherî û baweriya gel zêde bi PKK`ê hat. Gulo da zanîn ku gel ji dijmin pir ditirsiya û ji ber bîrdoziya wan partiyan ya lewaz, gel nedikarî baweriya xwe pê bîne, lê PKK`ê destpêkê bawerî da gel û îradeya wan xurt kir.

### PKK doza azadiya gelan dike

Rêber Gulo diyar kir ku gel bi axaftin, xebat û exlaqê PKK`ê bawer kir û axaftina xwe wiha dewam kir: "PKK felsefeya azadiya gelan û demokrasiyê esas digire, em li ser vî esasî tevlî fikirê wê bûn. Me bi riya wê zanî ku divê em ji bo doza xwe bixebitin."

Rêber Gulo bal kişand ser gotina bavê xwe û wiha got: "Ya ku li Kurdistanê xwedî derkeve û rizgar bike PKK ye, lewra jidil dixebite û xizmetê dike."

Herwiha da xuyakirin ku rojbiroj baweriya wan bi PKK`ê zêdetir dibe, tevî ku bi hezaran ji PKK şehîd bûne, lê hîna jî di rizgarkirina Kurdistanê de bi îsrar in û bawerî û îradeya wan pir xurt e."

### Di nava tevgera azadiyê de jinan erkê xwe nas kir

Rêber Gulo bal kişand ser felsefeya Rêber Ocalan bi taybetî derbarê azadiya jinan de û wiha got: "Jinan di nava PKK`ê de roleke mezin lîst. Ji cîhanê re da diyarkirin ku jin dikarin di her warê civakê de bixebitin û erkên mezin bidin ser milên xwe."

Rêber Abdullah Ocalan derbarê azadiya jinan de dibêje, `Heta têkoşîna azadiya jinan bi ser nekeve, wê têkoşîna sosyalîzmê, tekoşîna demokrasî û azadiyê jî bi ser nekevin`.

Rêber Gulo diyar kir ku PKK`ê wek mizgîniya azadiyê dibînin û wiha domand: "Me di nava PKK`ê de azadiya xwe dît, felsefeya Rêber Ocalan ji me re mîna ronahiyekê ye, berî naskirina wê em di nava tariyê de bûn, PKK ji bo gelên Rojhilata Navî bû ronahî."

### Xistina PKK nava `lîsteya terorê` bêbextî ye`

Rêber Gulo diyar kir ku xisti-



na PKK`ê ya "lîsteya terorê" kiryareke dermirovî ye, lewra PKK demokrasî, edalet û wekheviya tevayiya gelan esas digire.

Herwiha da zanîn ku dewletên PKK xistîn "lîsteya terorê" dixwazin tolê ji PKK`ê hilînin û di nava civakên azadîxwaz de reş bikin, lê nikarin bi vê vîna gelên azadîxwaz bişkînin.

Rêber Gulo di dawiya axaftina xwe de got, divê PKK`ê ji "lîsteya terorê" were derxistin û gelên azadîxwaz vê bêbextiyê qebûl nekin.

# Dema Sûriye dikeve saleke nû



**Zekî Bedran**

Sûriyê saleke din bi şûn xwe ve hişt. Salên bi xizanî, wêranî û mirinê hatîn ristin saleke nû bi ser wan ve bû. Dewleta tirkî sala 2021ê jî navber nedan dagîrkerî û êrişên xwe. Bi çeteyên li dora xwe kom kirîn bermayiyên DAIŞê û El Nusra vê salê jî berdan ser serê gel. Talan, işkence, destdirêî û zordarî bûn barçeyên jiyana rojane. Di hefteya dawî ya salê de jî dewleta tirkî bi balafiran êrişê Kobanê kir û mohra xwe li komkujiyeke nû da.

Rûsya, Tirkiye û Îran gelek caran li Astana tên cem hev. Civîna xwe ya dawiyê nû qedandin. Encama vê civînê ya herî berbiçav ew e ku di dijminiya Kurdan û dijberiya Rêveberiya Xweser de digihin hev. Qada hewayî ya Kobanê di binê kontrola Rûsya de ye. Eger Rûsya destûrê nede yan çavê xwe negire, wê dewleta tirkî çawa navenda Kobanê bombe bike? Jixwe ev ne bombekirina yekê ye. Eger êriş li erdê be dibe ku bêje êrişên li hemberî hev çêbûne. Lê ev balafir di destê Kurdan de nînin. Ji aliyekî ve bênavber êriş û komkujî dibin. Dewleta tirkî dibêje ezê li ber çavê dinyayê û herêmên di binê berpirsiyariya dewletên mezin de tişta bixwazim bikim. Qaşo Amerîka û Rûsya li hev kirine ku li Sûriyê şer gurr nebe. Peyamên wisa didin dinyayê lêbelê zordestiya Tirkan li derveyî vê dihêlin. Kuştin û qirkirina Kurdan ji dewleta tirkî re serbest e. Rejima Sûriyê çi dike? Derbasbûne dewleta tirkî ya erdê Sûriyê, domandina dagîrkeriyê û kuştina welatiyan ji bo kesên li Şamê rûdinin tê çi wateyê?

Nûnerên rejimê tişta ji wan re girîng destpêkê desthilatdariya wan e. Ewleyiya can û malê welatiyan ji bo wan ne girîng e. Halbiku li seranserê sînorê Sûriyê leşkerên Sûriyê bi cî bûne. Herêmên Xweser bi Rûsya re li ser sînor bi hev re tev digerin. Rûsya jî di van mijaran de berpirs e. Lê dema Tirk êriş dikin temaşe dikin û dengê xwe nakin. Têkiliya van êrişan bi Rûsya û rejimê re heye. Bi taybetî Rûsya gefên Tirkan bi kar tîne û dixwaze bi wî awayî Kurdan bixe binê nîrê rejimê. Rejim dixwaze herêmên xweser lewaz bibin û tevlîhev binin. Li devereke wiha ku gelek hesab û lîstikên cuda hene aştî, aramî û çareserî jî pêk nayên. Gelê Sûriyê ji ber hişkiyê saleke zehmet derbas dike. Ambargoya aborî ya li ser rejimê rewşê girantir kir. Bilindbûna dolar bihabûn zêde kir. Rewşa jiyana gel her ku diçe xirabtir dibe. Lê rêveberiya Şamê rastiyan vedişêre. Çavkanî ji bo pêdiviyên gel bi kar nayên. Her tiştî bi hêzên derve ve girê didin. Jixwe rejim derbarê roxîna Sûriyê, belavbûna welet de xwe berpirs nabîne. Halbiku welat di binê rêveberiya wan de ket vê rewşê. Bêguman para hêzên derve jî tê de heye, lê eger li Sûriyê yekîtî û demokrasî hebûya hêzên derve wê nikaribûyan welat tevlîhev bikin. Li devarên rêveberiya yek partiyê, zordarî û qedexe lê hebin gel ji dewletê dûr dikevin. Girseyên mezin dibin dijberê dewletê. Dema serhildan û xwepêşandan dest pê dikin hin serî li çekan jî didin û hêzên derve jî destekê didin hina. Çawa ku dema Sûriye tevlîhev bû Tirkiyê di cî de sînorên xwe vekirin. Piştgiriya hêzên weke DAIŞ û El Nusra. Pişt re bixwe jî dest bi darîgkeriyê kir.

Sûriye dikeve saleke nû. Lê li ber çavan ti çareserî xuya nakin. Beşar Esed hilbijartin kir û diyar kir ku bi rêjeyeke pir bilind dîsa hatiye hilbijartin. Hilbijartinê hêvî û bawerî neda. Lewra bernameyeke rejimê ya aştî û demokrasiyê nîne. Dixebite ku bi desteka Îran û Rûsya li ser piyan bimîne û desthilatiya xwe xurt bike. Xurtkirina desthilatdariyê pirsgirêkên gel çareser nake, dagîrkeriyê naqedîne. Ji bo azadî û demokrasiyê gav nayên avêtin. Xêzkirina taboyeke reşbîn bêguman ne ras te, lê divê em ratiyan jî bêjin. Sala li pêşiya me jî wê saleke xizanî û pirsgirêkan be. Jixw zivistaneke zehmet heye. Tecrûbe û tiştên bûyîn nîşan dane ku çareserî bi demokrasî û yekîtiya gelan de ye. Modela Rêveberiya Xweser ronahiyê li Sûriyê belav dike. Gel dikarin di nava aştiyê de û bi hev re bijîn. Eger li ciyekî ziman, çand û bawerî bi awayekî azad bi hev re bin, ne xizanî wê dewlemendiyê b îne. Hiqûq, demokrasî û azadî afrêneriya mirovan derdixin meydanê. Berhem pir dibin û eger mirov li keda xwe xwedî derkevin, wê pêşiya dizî, bertîl û kurtêlxweriyê jî bê girtin.

Daxwaziya me ji bo gelên Sûriyê ew e ku sala nû paşrojeke baştir pêşkêşî wan bike. Ji bo ku gel ji bo jiyan û paşroja xwe biryarê bidn divê xwedîîrade bin. Ji bo wê jî divê xwe perwerde û bi rêxistin bikin. Gelên rêxistinkirî bin nakevin. Gelên Sûriyê berdêlên giran dan. Êşên giran kişandin. Ji bo ku ev dubare nebin divê gel dest li pêvajoyê werdin.